

bû çend sal in em ketine pey wî, xewa pir şevan û hem-
bêza pîrekên me, wî ji me diziye. Bi gotina dawî re pa-
neke tijî keser li devê Diranê Pîrê dide û sê diranên wî
dişkîne.

- Ez tucarî wê şevê ji bîr nakim, ez di ser sîngê pîrekê
de bûm û hîne bi memikên wê şa dibûm, deng bi telêfo-
nê ket û, bi boneya vî dêdêliyî, divyabû bêm mexferê.
Eve ew ketiye nav nigên min, min bi serê bavê xwe
sûnd xweriye ku vê keysê ji dest xwe bernedim. Dest
davêje qayîşa xwe... Herduyên sekinî jî kenê xwe bi
kûna wî ya werimî dikin. Bi rabûna berdevkê oda fi-
randinê ji ser piştta Dirên xwîn di paşiya wî re davêje.

- "Te çima ez bi tenê hêştim, tu çû û te baran jî bi xwe
re bir. Cadeyên bajêr dengên solên me nasdikirin û hîne
li pir kolanan dengê kenê te difire". Wan çiqas kolan û
cadeyên bajêr hene, gav bi gav, pîvane. Destên xwe
dixistin ên hevdu û didan dû lîskên baran û çivîkan,
heya bi derpiyên wan ên binî dihatin şuştin. Pir caran
dilopên baranê ji ser lêvên hevdu didizîn û piştî
tazîkirin û demeke dirêj, di nav nivînan de, hevdu ziwa
dikirin.

Çima zaro dizên. Kuştin û gorandina mirovan fireh
dibe; Ezmanekî nuh ji welêt re gereke, nema perispan
bi kêrî yê berê tî û çermên ên gorandî hîne çend perçe
bi hev nexistine.

Diranê Pîrê wêneyê dest xwe davêje, dilopên xwînê tu dever nehêştine ku pê nehatine riswakirin. Radibe ser xwe û ber bi quncikê ku kiribû xwaringeh diçe, henefiya avê vedike; bablîsokeke tozê jê diherike. Radihêje paçikê paqijkirinê ewê ku Stêr ê ji ê kurtikekê xwe yê kevin qetandibû, û di der-dora birînê re dibe û tîne.

- "Pîvaz derman e". Pîra Zîno pîvazeke ji mistekê dipelixîne û datîne ser eniya wî; "Meymûn, te li piş kerê çî dikir". Çend pîrekên rûniştibûn çavan dikin hev û kenekê toxmî li ser wî dibarînin; "Evqas pîrekên birçî di gund de û tu derî piş kerê, wê tukêmasî nekiriye dema eniya te şikandî". Diya wî bi riyên xwe digre û wî li dû xwe dikşîne mal.

Kesê di cadê de sekiniye, hîne di ciyê xwe de maye, Diran bi dizî perdê ji ber çavên xwe yê werimî bi dûr dixê; "Rûyê mirovan wek hev in lê ew bi solên xwe ji hev cuda ne". Sola wî di bin tîrên demsala payîzê de dibrûsin.

- "Solên wan jî mîna rûyên wan dûz û paqije. Ew çawa, zû-zû, karin lekên xwînê û perçên eyarên mirovan bişon?!. Qey ew gihêştine tiştêkê ku, karibe her lekeyekê bişo, heya hêsrên mirovan jî ziwa bike".

Soleke fireh bû, têra welêt tevî dikir; bajar û kesên wê, tevî mizgeft û cadeyên bajêr, ezman û barana reviyayî, zarok û çivîkên serjêkirî, evîn û yaran.. Xwedê

jî dikarîbû ji xwe re cihekî di wê solê de bibîne.

Wî davêjin hembêza solê, nigên wî mîna benikekî rizyayî di du qulikên solê re dikşînin, ji xwêdan û lekên xwînê, eyar bi çirandina pantiron re diterişe û weke du guhên bel bi eniya solê ve li ba dibin.

- Ev çovên di ziraviya tiliyên wî de we dîn e, divê weke stûnê nivê konên koçeran, di bin nigên wî de stûr bibin. Enî, zik, çav.. nebêjin ev der bive ye em lê nexînin. Gereke ew bêje: Ax, ew bifire û qêrîna wî bighe serok". Berdevkê odeya firandinê dibêje herdu berdestên ku Diran anîbûn, û tiliya xwe berve gurzeke çovên hinaran ên ter dirêj dike.

- "Çerm û hestî yên me ne û goştê wî yê te ye". Bav dibêje mamoste û destê zaroyê xwe dixê nav lepên gur. Xwêdan di ber nigên herdu berdestan re davêje û yek dilop jî ji banê oda firandinê diweşin.

- Kurê segan, çima deng ji te nayê. Dergevan deng li berdestekî dike ku devê wî veke û zimên bikşîne. "Çima li derve zimanê we dirêj e û hûn bes dighên vir, hûn di paşiya diya xwe de ji bîr dikin". Şivika hinarê ya ter di zimên de dûz dike û nivbirî dike, çend dilopên xûnê dipijiqin ser rû û solên wan. "Tufî, çî xwîneke pîs e... Lawê dêlan, bi hezaran ên weke te di vir re derbasbûne û tevan bi zimanên xwe solên me alêstine. Wan ji bo cixareyekê derpiyên pîrekên xwe ji me re

sistkirine. Qey tu ji tevan çêtirî". Kuzotên êgir di keze-
ba Dirên de vêdikevin û guloverên sor ji çavan difûrin;
di wê baweriyê de ye seriyê wî qelaştine û komeke ku-
zot avêtine nav mejiyê wî. Ew piştî demeke dirêj pê
hest dibe ku hêlika wî ya çepê perçiqandine. Qîrîn û ha-
tina serok dighên hev.

- We sipas dikim. Wî vegeerînin oda bi tenê û herin so-
lên xwe paqij bikin. Ewî got û bi hêmeneke sar cixare
xist devê xwe û bi xweşî nefes berdan.

- "Tu ji min re derya şîn bû û çavên te du kelekên
şikestî bûn, ji mêj ve li kelekvanekî digerîn".

Di rojêke payîzê de -demsala herî bi tenê li welatê
tozê- di demên ku hîne yek ewir baranê di ezmanê we-
lêt re diborîn, Diranê Pîrê sîngê xwe ji tava baranê re
vekiribû û dabû dû dengê lehiyeke ku di bin erdê re di-
herikî. Ew jî bê sîwan li ser riya zanîngehê bû. Çend
şofêrên servîs, zemûr û dilên xwe jê re vekirin, li şûna
ku ew destên xwe bavêjin fîtêsê, gunên xwe yên we-
rimî misdidan.

Keçeke dirêj û zirav e. Porê wê yê reş û baranê ke-
tine cirîdeke rewan; ka kî dikare bêtir rêşiyên xwe bi
ser pişta wê de darivîne. Çakêtê cild û pantironê cenz
nikaribûn rê li ber şilbûna derpiyê wê jî bigrin. Mîna
geyîkeke asê serî hildaye, her çend gavan, carekê xwe
bi banî de çen dike û şiqinên darên di ser rê de dihejîne;

dihêle misteke din e baranê bi ser de bibare.

Baranê bibar bibar

Delalê bibar bibar

Qirika genimê me xwar

Sêwîka serî yê hev xwar

Hezar şev û şiv ji bo misteke goşt û gurzeke por dişewitand. Pir şevan, piştî demeke dirêj û bê xew, di nav nivînan de dipirpitî, ewkê xwe diguvaşt û xweziya di tîrbûna mêst de tufî kefa dest dike, hezar zinar ji ser pišta wî diherikîn.

Kesên bajêr bûne du perçe; perçeyek bi xwe û "kenê şeytên" de ketî û yê din bi dûketin û binçavkirina vî perçeyî mijûl e.

Dîtin û naskirina keçikê ku, li kîjan fekûltê dixwîne hêştine Diranê Pîrê ji mamosteyekî bêtir li zanîngeh û çayxanên wê bête dîtin. Tiştê din ku dihêst ew bêtir li wan deran bête xûyakirin, naskirina hinek şagirtan jê re û her diçû ew bi gotina; "mamoste" diwerimî. Lê evê yekê jî nedihêst ku ew, mîna zaroyekî, li pey Stêrê, di nav riyên gulîstana zanîngehê de, nebeze.

Ewqas roj, hezkirin, cûtina gotinan û qîr-qîrên wî di civatên bi xwe re, eger di heyameke sayî de rastî wê bê dê bi geza sîngê gihîştî bixwe, devê tijî gotin vala bike û zimanê ku ji hezar salan ve pûçbûye bike lîp-lîpokê maran. Lê gava Stêr di jorî wî re disekine, mîna mêxekî

bi danîştokê ve tê mêxkirin.

- Ezê heta kengî di jorî te re bisekinim û tu yê nebêjî min keremke, rûne. Hin caran ez dixwezim ez kilasîkî bim û law bidin dû min, ez cihê dilxweziyên wan bim. Keçika por sûlav rûnişt û gotinên xwe ji xwe re, ji masa ber wan, ji wî û dîwarê çayxana zanîngehê re, ne ji kesî re digotin û bêyî ku ew çavên xwe ji kitika ku, dide dû pinpinîkê bibire, careke din, deng pê dikeve: "Ew girt, biner çawa pê dilîze û herdu jî bi vê yekê şa ne".

Bûdeliyeke fireh bi qasî riwê Dirên li ser rûdêmê wî belav dibe û berkeniya wî ya zer hîne bêtir beloq dike. Ev hest mîna eyarê wî bi canê wî ve digre û her diçû kûr û kor dibû, ew jî pê re biçûk û qelstir dibû.

- Tu nuha ji xwe dipirsî ka ev çi keçeke aza ye. Bi şew û durvê min nexape; ez bi vê yekê qelsiyên xwe vedişêrim. Lehengên ku em wêneyên wan bi sîngê xwe, ên odê û welêt ve dadileqînin, ji hemû aferînên Xwedê tirsoktir bûn; bi boneya ku tirsî xwe veşêrin û kes riwê wan ê zer-beravêtî nebîne, ew derketin jor. Çima tu cêntilman dernakevî û naçî qehweyekê ji min re nînî, te hêştiye ez baxifim, gewriya min ziwa bû.

Bihina qehwê û kişandina cixareyekê sîngê wî û nîgara çayxanê fireh dike. Ew bala xwe dide tiliyên top yên ku cixare di nav de natebite û tê derdixe ku ya li hember wî rûniştî yeke agirnok e.

- Te negot ka ez çî dixwezim. Çima gava hûn bi pelan re rûdinin, gotin di mejiyê we de li hev dixurcilin, her yek ya din têve dide da ku ji berî wê derkeve, lê gava hûn bi yekê -ji me- re rûdinin, hûn dibin kewê Evdel. Min jî weke pelekî li pêş xwe bijmêre û gotinên xwe bi ser min de velûke. Gotina dawiyê, hinekî madê Dirên li hev xist; Tu çima zer bû. Qey hestên te evqasî teknikbûne. Ev tişt di nivîsandinên te da netê dîtin' nivîsandinên te tijî kêz û kurm û verîşî ye.

- Ez naxwezim ew bighên fincana mina qehwê û riwê te. Ji bo pirsê te jî; ka tu çî dixwazî. Eger ne îro be, siba tuyê ji ber xwe bêjî, tu çî dixwezî.

- Tu ji xwe razî ye. Tu di wê baweriyê deyî ku emê siba jî hevdu bibînin.

- Çima na. Keçik fincana xwe dide aliyekî û ji ber masê radibe, sipasiya wî dike û ji çayxana zanîngehê dertê.

Roja dîn, hine zaro li ser riyên dibistanan tiliyên xwe yên zirav misdidan -da ku karibin di bin çavên mamoste de xwe ji hev dûr nexin- deng bi deriyê wî dikeve; "Ev çend salên min in ku min ev odeya ser dîkanê kirêkiriye û min hîne negotî tukesî: "Kî ye evê li derî dide". Bêyî ku bighê û çavan bişo, berve derî diçe.

Bihna gulên û keçikan buhşteke bê sînor e. Dîkê ku, li ser sêrgo jî bangil dide, bihuşta xwe bi ya Xwedê naguhêre. Vekirina derî dihêle baxeke gul derbasî

odeya wî bibe. Ev cara pêşî ye bihna gulan ji odeya xwe dike. Wî ji zû de, carekê, gulek kir dest xwe û ji keçika ku, di balkona hemberî wî de disekinî re anî, lê dema xwast jê re bavêje, keçik reviya û bi tirs deriyê ser balkonê girt hêşt ku Diran rahêje soleke xwe ye kevin, bi dîwarê odê ve daleqîne û ewê gulê tê de biçîne. Ew roj- ev roje ku, careke din ber bi firosên gulan ve binêre.

Bazirganek gulên bajêr tevan dikire û li ser riya firosgehê û hotêlê rêdixe da çavên wî ji bilî gulan tutiştî din nebînin û gava dilbijek dest davêje gulekê ji wan gulan ku, diyarî dilbera xwe ke, sê tiliyên xwe di nav baxê gulan de winde dike û dilopên xwînê ji gula sipî dadirivin.

Hejmara bazirganan kêmbibe û yê kûndeyan her diçe zêde dibe. Ew bi hemû tiştên dinê mijûl dibin; dikirin û difroşin, mirovên reng-rengî, ji cotar û mamosteyan, nivîskar û qewadan, mirîşk û roviyan.. hemû tişt di çarşiya wan de dihate bazarkirin. Rojekê bazirganekî gurzeke kilît kiribûn dest xwe û di nîvê bazarê de bang dikir; "Werin kilîten bihuşt Xwedê". Eger wî bixwesta karîbû bi jî bigirta û baniya li bazarê bifrota.. Lê camêr hinekî rûmeta xwe digirt.

- Ez ji te hez dikim. Bi baxê gulan re, hevoka çûye diyarî wî dike û dihêle Diranê Pîrê têkeve bin xeyalan,

çavan bikole. Lê ew e; keçika duh e û li ber deriyê wi ye, ne di xew de dibîne. Bi vekirina destan re, Stêr xwe davêje hembêza wî, hêsrên Dirên bi porê wê yê reş re dikevin cirêdeke rewan; ka kiyê berî yê din xwe bighîne sîngê wê; gelî û herdu girên dorê avde û bihêle şînkayî, bê tirsê ji tozê, serî hilde.

- Ev bû çend rojin ku ez ji bo te li zanîngehê dewamdikim. Keçik dikene; tu bi min dikenî ku ji bona keçeke di temenê zarên min de, digrîm.

- Na, ez bi xwe dikenim ku çawa, her min fikir ez bêm cem te û bêjim; Ez ji te hezdikim, kabokên min sist dibûn û dilê min mîna çivîkeke serjêkirî di sîngê min de dipirpitî. Vê yekê dihêşt ku, ez ji xwendin û dostên xwe, ji dê û bav... ji hemû tiştî birevim odeya xwe û derî li ser xwe bigrim da ku, karibim bi rihetî bigrîm, heya gihîşt vê rojê ku hêsir di çavên min de ziwa bûne. Çima ez zû nehatim.

- "Tu dereng hatî û zû çû, Çima". Bê hest li ser dêv ketiye û çend mêşên zer berî devê bi xwîn kirine. Dema cerdûn pelika guh jêdike, ew bi zorê di qurzîka çavê werimî re li wî dinêre; "Ez karim ya te fêmbikim ku tu ji birçîbûna re guhê min gezdikî. Eger ez li serhev bama û min tu bigirta, minê tu bi xwara. Bes ka bêje min, çima evên din dixwazin, hino-hino, çinîkên goştê min biqetînin bêyî ku ew birçî mabin". Wî xwe bi dev

cerdûn de berda; Erê carekê ji carên girtinên wî, ew xistin korta avrêjê û heya ber bi dêv jî gû bilindbû û cerdûnan ji vir û wir êrîşî seriyê wî kirin û pir şan, heya bi nuha jî, jê re hêştine. Lê îro ev cerdûn li ber dilê Diranê Pîrê destekî pir zîzbû; aferîdeyekî din, du çavên din di wê valahiya beyabûnê de dilivîn û tenêtiya wî û bê dengiya zindana wî dişkand.

- Tu dizanî ku cîhan bi qalîqê pîvazekê ye, kûndeyek e; her rojekê di hembêza yekî de derbas dike û koma qoqên zaroyan bilind dibe û dibe. Ez zanim ev nirîna te ya bi qehir ji bo çî ye; çima ez hişê xwe naxînim seriyê xwe, çiyê min ji azadîyê heye, ew ne dê û yara min e, ne jî ewrekî baranêye ku, stûyê min di bin de bişkê da ku wê bi ezmanê welêt ve girêdim. Erê ez vê dizanim û bi şev û roj min digote vî seriyê hişk lê tutişt pêve nedîçû; tiştê nedîtî, êşeke zirav di nîvê dilê min de nedihêşt ku ez ji bo azadî, welêt, baran û Stêrê nestirêm. Tu yê çî bêjî, ez mirovekî sersam im, bê hişim.. bes ne bê rûmet im û eger tu bawer nakî ji segên berdayî bipirse. Erê min pir sîng mêtin, destên min ketine bin pir derpiyan û heya keçikên ku, nuh seriyê gupikên wan di pişkivîn jî min gezkirine, bes dilxweşiya min ewe ku, min ev giş bi hezkirineke sayî û dilsoz dikir.

Kûndetîya mirov ew e ku bê hezkirin meya sîng binoşê, belê ji wir tê.